# ADÎLE XANIM “Kralîçeya BêTac"

1.Adîle xanim navê temamê wê “” keça Abdulqadir Begê kurê Hemîd Begê SahîbQirran e. Malbatê wê di sala 1851ê de û piştî ketina Mîrnîşîna Babanê ku paytexta wê bajarê Suleymaniyê bûye, ji wir koç dikin ber bi mîrnîşîna Erdelanê li rojhilata Kurdistanê ku bajarê Sineyê peytexta wê mîrnîşînê bûye. Di sala 1859 her li bajarê Sineyê Adîle xanimji dayik dibe. Di temenekî kin de çûye ber xwendinê û binmayên Qûranî li bal mamosteyên taybet xwendiye. Di sala 1887ê de û di temenê 18 saliyê de jiyana hevjîniyê bi “Wesman Paşah”ê serokê eşrîna Cafê re pêkaniye, piştî pêkanîna jiyana hevjîniyê têne bajarê Helebceyê, ew weku jinxaseke diyar piştevan û alikarê hevjînê xwe bûye.

2. Piştî mirina Wesman Paşayê hevjînê wê, di sala 1905ê de Adîle xanim ji ber keybanûyî û jêhatûbûna wê dibe serok û serdara eşîra Caf, nav û navdenga wê bi hemû herêmên Şahrezûr û Hewraman û başûr û rojhilatê Kurdistanê belav dibe. Dîwexan û seraya wê hertim tijî mêvanên navxweyî û biyanî bûye.
Piştî cenga cîhanî ya yekemîn, Adîle xanim serokatî mezintirîn eşîra Kurd kiriye û hukimdariya wê hende mezin bûye weku kralîçeya BêTac a Şehrezûrê nasnav bûye. Xwedan îzzet û kesayetiyeke mezin û karîzmatîk bûye û hemû rêz lêgirtine. Bi jîrî û zanayiya xwe yekîtî û yekrîziya erşîra Caf parastiye.

4.Dayika her du şaîrên navdarê Kurd “Ahmed Muxtar Caf û Tahîr Begê Caf”e

5.Ew xwazyara avahkarî,  xwedin û zanistê bûye û pêşketin û nûxwazî armanca wê ya sereke bûye, di saya wê de gelek koşk û sazimaniyan li bajarê Helebce hatin avakirin. Di çaxa wê de dibistan û navendên xwendinê li bajarê Helebceyê ava kiriye her weha mizgeftek jî bi navê “Xanim”êava kir û qeyseriyek jî nû jî ava kiriye. Ew bajarê Helebceyê ji gundeke îhmalkirî, kirine bajarekî geş û pêşketî.

6.Di geştname û yadaştnameyên gerîde û rojhilatnasan de navê wê bi mezinî hatiye tomar kirin.

Admondiz efserê arteşa Brîtanyayê li başûrê Kurdistanê ku dûre bû dajdar û hakimê Brîtanyayê li Îraqê dibêje: Piştî mrina Wesman Paşayê hevjînê wê, hemû desthilatên wî ketin destê Adîle xanim ku di rastî de Kralîçeya BêTac a Şehrezûrê bû. Înglîzan ji aliyê xwe ve nasnavê kesatiya Hîndî “Xanim Behadûr”ê bexşîne wê.

“Mêcerson” di sala 1905ê de weku bazirganekî fars û bi navê “Xulam Huseyinê Şîrazî” serdana bajarê Helebceyê kir û zêdetirî şeş mehan li mala Wesman Paşayê nêzî Adîle xanim û Tahîr Begêkurê wê dimîne, di geştname û yadaştnameya xwe de derbarê Adîle xanim dibêje: Adîle xanim jineke bêmînak û zana û xwedan kesayetiye bihêz bû, dajdara herêma Şehrezûrê bû ne tenê li ser asta siyasî de belku li ser dadgeha xwe avakiriye û zîndanê ava kiriye û her bi xwe jî serdariya wê kiriye û kesên xerabekaran jî ceza dikir. Her weha koşk û talarên xweşik û bazarên rêkûpêk li bajarê Helebceyê saz kirin. Ew bajarê Helebceyê ji gundeke îhmalkirî yê bindestê Osmaniyan kir navendeke siyasî û bazirganiyê ku dewleta Osmanî dexesî û kîna xwe lê kiribûn. Di herêmê de tu kes ji gotina wê dernediket, her aliyan neçar kiribû ku rêz ji wê û hukima wê bikirin û fermanberiya wê bikin.

Mîs Bêll muxaberatekî Brîtanî bû li rojhilata navîn, di sala 1921an de dema serdana bajarê Helebce dike û Adîle xanim dibîne û di behsa Adîle xanim de dibêje: Em weku Brîtanya çênabe hesabeke taybet ji bo Adîle xanim nekin û ew di herêmê de baladest e û hakimiyeta eşîra Caf dike, Hêz û bandora wê gelek ji wê zêdetir in ku bikaribî jê bifikirî, ew weku Xanim hayên Kurd tevidgere. Ew bi cil û bergên xwe yê qeşeng a Kurdî û zulfên xwe yên reşa qetranî ku di bin mêzera xwe ya mezin û rûyên xemlndî de şorr bûye, xwedan kesayetiyeke karîzmatîk û balkêş e.

7.Kar û tevgerên Adîle xanim bû sedema nerezayî û xîreyiya Osmaniyan û xwastin desthilata xwe bi ser herêma wê û bajarê Helebceyê de ferz bikin, b her awayî hewl dan têkevin bajarê Helebceyê, lê Adîle xanim bi tu awayî rê neda wê merama wan bi cî were û rê neda dewleta Osmanî bingeh û baregehên xwe li herêma bin hukima wê dasaz bikin.
Ew Osmanî weku dagirkerê sersext û serekeya Kurd didît û dijî wê yekê bû ku tevgerên Kurd nêzî dewleta Osmanî bin.

8.Di roja 11ê nîsana sala 1924ê de Adîle xanim di temenê 65 saliyê de koça dawiyê kir û li goristana “Ebabeylê”ya li bajarê Helebceyê hatine binaxkirin.